Miradxan Evrîkî

WERE

Were ciwanê hil gêjim
evîna xwe bo te bêjim
Ez kencekê rast bêjim
di evîna demê te da.
Ezê serxweşim ezê gêjim
hindê ez.
Çavê xwe digrînim
demê ez te nabînim
wê xemêt xwe çawa revînim
ez diçime nav parkan,
tebûr û sema lêdan
bi pê wan her du çavên belek
cîhan ne xweşe gelek
ger te nebînim li dem û gava
Li gel vîna cerg û hinava
ez bo bikim diyarî û silava
silavêt min li astê evînê
dê were ta te macî kim
da esmerê xwînşêrînê
evina te li min agir e
Dê were cerg û hinava li min nebire
Birîn reş kirî
nexwezîkên wê rojê
Demê min tu bi şepalê nas kirî
evîna te
dilê min wekî muxlekê
wê kun kun kirî
Ciwanê!
te hemî hizir û bîr têk....
te dil dilê min ji evîna xwe da nazik
kire gemiyan
Çavên min
çavên min hemî demê te
wekî şaşa kompiyotirî
win zep kirin
ger nezanî
were cem min bi viyanî
ez ji bo evîndar im
ji wan **keziyên** reş xembar im
lewma ez bi qîr û hawar im
nazdarê nazelînê
tu pir delalê, gelek şêrînê.